## Diyarkrina Çarenivîsa XelkekîanNeteweyekî.AngoXwe birêvebirin(self Determinasyon)

»»» R:9



## Çeka xapandinê

»»» R:3

## 76 sal berî niha

»»» R:4

## Xaka Evînê

»»» R:6

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (443) 04-04-2023Buha (1000) Tûmen*

# 200 roj, 200 ezmûn

Piştî vê ku rejîma dîktatora Îslamî, di meha Xermanana sala derbasbûyî de, keça Kurd a bi navê Jîna Emînî li Tehranê kuştin, û ev yeka bû sedema destpêkirina nerizayetî û piştre şoreşeke berfireh a seranserî bi dijî rejîmê, û niha tam 2oo roj in bi ser de derbas dibin.

Renge baskirin ji çawaniya aliyên cuda yên vê şoreşê gelek demê bixwaze, lê gelek girîng e ku em bizanin bi sedema vê şoreşê, xelkê Îranê çi ezimûn bidest ve anîn û xalên erênî û nerênî çine.

Vê şoreşê ev ezmûnên erênî bo cara yekemîn xist pêşya xelkê, wek:

* Piştî hatina ser kar a rejîma dîktatora Îslamî cara yekem bû ku yekîtî û yekdengiyeke wiha berfireh di nava xelkê seranserê Îranê de pêk bê.

* Di dîroka mirovatiyê de, ev yekem car bû ku di Îranê de xelk yek deng wiha ji kuştina Keçekê xwedî derkevin û li ser vê hindê şoreşekê bikin.

* Di dîroka xebata gelê



Kurd de, ev yekem car bû ku xelkê din yên Îranê bi hemî cudahiyên netewî, olî, çandî, etnîkî û … hwd, piştewaniyê ji dengê nerizayetiya xelkê Kurdistanê bikin.

* Yekem car bû ku di şoreşeke wiha seranserî de bi dijî dîktatoriyê li Îranê de, netenê Jin û Keç mil bi milê Mêran beşdar bin, belkî Jin bûne pêşengê vê şoreşê.
* Piştî hatina ser kar a rejîma Îslamî, ev yekem car bû hemî qat û texên civakê û hemî sinf û bi taybet xwendevan di Zanko û Qutabxanan de, yek deng û yekgirtiyane di şorişeke seranserî de beşdar bin.

* Yekem car bû ku di şoreşa Jîna yê de, xelkê seranserê Îranê bi yekdengî dirûşma sernixûniya rejîmê didan.

* Yekem car bû ku hevdem di gel şoreşa nav xweya welat, hemî xelkê Kurd û netewên din yên Îranê li derveyî welat, girse û xwenîşandanên berfireh ji bona piştewanî ji xelkê serhildayî ya navxwe birê bixin.

* Ev piştewaniya li asta navnetewî û sazî û welatên cuda cudaye Cîhanê ji şoreşa Jînayê hatî kirin, heya niha li dunyayê de bê mînak bû.

* Givaşên navnetewî bo ser rejîma îsmamiya Îranê çend qat zêdetir bûn, wek dorpêçên zêdetire abûrî.

Belê îro rojê em dibînin ku ne tenê ev xalê serwe, belkî dehan xalê dinê wekî ezimûn û deskevtên şoreşa Jîna yê tên berçav, ya hemî tişteké girîngtir eve ku heya niha ev şoreş bi avayên cuda cuda berdewame û bê guman dê serkeve û dê bigehe hemî armancên siyasî û mirovî û civakiye xwe, lê şertê vê serkevtinê jî tenê li yekîtî û yekrêziya xelkê seranserî welat û bi taybetî yekîtiya hêz û aliyên siyasiye dijberî rejîmê de ye.

# Peyama Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 10`ê Xakelêweyê salroja Şehîdên Kurdistanê

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 10`ê Xakelêweyê salroja şehîdên Kurdistanê peyamek belav kir**

**Deqa peyamê wiha ye:**

**Xwîna bi neheqî hatî rijandin a şehîdên me, cewhera azadiya neteweya me ye.**

**Malbatên serbilind yên şehîdan!**

**Hevçeperên berxweder ên şehîdan!**

10ê Xakelêweyê salroja şehîdên Kurdistanê ye, roja îdamkirina Qazî Mihemed û hevalên wî ji aliyê rejîma dîktator a Pehlewî ve û roja rêzgirtin ji bîranîna bi hezaran şehîdên vê ax û welatê ku di rêya parastina nasnameya neteweya xwe ji aliyê du rejîmên navendgera ên serkutker ên paşayetiya Pehlewî û Komara Îslamî ve hatin şehîdkirin. Bi vê hilkeftê em di vê rojê de bejna xwe li hember şehîdên Komara Kurdistanê û hemû şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê bi taybetî şehîdên Şoreşa Jînayê ditewînin, em ser gora wan amade dibin û riha paqij a wan silav dikin, herwisa bona nûkirina peymanê serdana malbatên wan dikin.

Di vê rojê de, bi bawerî bi duristî û pîrozbûna armancên şehîdan û rêya serbilind ya wan dubare dikin, ku heta bicihanîna armanc û hêviyên şehîdan, di serî de Qazî Mihemed, Dr.Qasimlo, Dr.Şerefkendî û hemû şehîdên Kurdistanê, ji têkoşîn û fîdakariya azadiya welatê xwe di çeperan de, em ê berxwedaniyê bikin.

Malbatên serbilind ên şehîdan!
Pêşewa Qazî Mihemed nêzî heşt dehkan berî niha rêya rizgariya netewî ji me re berhev kir û bi avakirina Komara Kurdistanê şerefeke mezin û destkevtên giranbuha ji me re weke mîrat hişt. Xebat û destkevtên Komara Kurdistanê di warên siyasî, perwerdehyî, berxwedanî, civakî û medenî û nirxên weke taybetmendiyên şoreşgerî yên ku di civaka Kurdistanê de belav bûne, para herî zêde ya wan vedigerin şiyan û jîriya Pêşewa, û biqasî xuya û berçav in ku bi derbasbûna 76 salan, gelê Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê hê jî şanaziyê bi wan dike û ji bo afirandin û vejandina neteweyeke wiha mezin kar û xebat dike. Destkevt û navendên ava ku ji aliyê Komarê ve hatibûn damezrandin, li ser bingeha bîr û hizra Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî di Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de, hîn jî şiyana bîr û baweriyên netewî zindî ragirtine û bûne sedema nasnameya Kurdî weke xerîteya rizgariya piştî derbasbûna heşt dehkan bi ser damezrandina Komarê re, bila bibe ruhê çelekngiya zarokên Kurd.

Pêşewa Qazî Mihemed hemû hewlên xwe di rêya bihêzkirin û dana îradeya kesayeta gelê Kurd de bi kar anî. Ewê ku di roja 10`ê Xakelêweyê de canê xwe ji bo miletê xwe fîda kir, berê jî li ber îradeya xwe ya xurt û rastiya dîrokê, mirin bi çod anî bû, ji ber vê sedemê jî rastî di bê îdaletiya Paşayetiya Pehlewî de heqîqet fîdayê berjewendiyên xwe nekir. Bi berevaniyeke bivêrane û mirineke serbilind, berpirsiyarî û erka xwe bi tevahî bi cih anî û bi vî awayî ew û doza xwe herheyî man.

Mihemed Riza Şah bi hilbijartina “Çarçira”yê wek cihê ku Komara Kurdistanê ji bo cîbicîkirina cezayê darvekirina Pêşewa û hevalên wî tê de hatiye ragihandin, wisa dihesiband ku bi vê kiryarê, ne tenê Qazî Mihemed, beklû hizr û xebatên wî jî dê bi dar ve bike û reha vê dê qut bibe, lê hizra Pêşewa û Komar di dilê civaka Kurdistanê de ewqas kûr bû, ku piştî derbasbûna heşt dehkan, hîn jî remiz û yekîtiya neteweyî û têkoşîna miletekî ji bo rizgarî bidestxistinê, mafê wê ne. Komara Îslamî ya Îranê wek mîrata siyaseta înkar û jenosîda padîşayetiyê, heman rê girt û xeyal kir ku bi îdamkirin û kuştina rêberên Partiya Pêşewa û şehîdkirina bi hezaran têkoşerên vê siyasetê û êrîşên mûşekî bo ser navend û baregehan, wê bikaribe doza maf û riha têkoşeriyê di Îranê de dê biçok de bîne; Lê bersiva ku wê rejîmê li ser şeqamên Kurdistanê wergirt, îspat kir ku ew tişta ku heta niha kiriye û dike, pûç e.
Gelê Kurdistanê yê têkoşer!
Jin û ciwanên zana û azadîxwaz!
Roja 10ê Xakelêweya îsal, roja şehîdên Kurdistanê, di demekê de tê ku Şoreşa Jînayê ku ji bîr û ramanên Pêşewa Qazî Mihemed hatiye hilanîn, zêdetir ji şeş mehan e ji bo hilweşandina desthilatdariya Komara Îslamî berdewam e. Kurdistan wek destpêka şoreşa Jînayê û Jin, Jiyan, Azadî weke felsefeya cewherî ya vê serhildanê ku ji Komara Kurdistanê derdikeve, berhema dînamîzm û jîriya Pêşewa ye ku di nav damarên nifşa nû ya wî gelî de diherke. Mêrxasiya zarokên Kurd û wêrekiya di qurbanîdan û pêşxistina canfîdaiy û pêkvejiyan û yekrêziya rêzên neteweyî de û taybetmendiyên ku îlham û rehên wan vedigere kesayetiya Pêşewa Qazî Mihemed û bandora wî ya mayînde li ser tevgera siyasî ya gelê Kurd.

Taybetmendiyên vê şoreşê wêneyeke zelal ji paşeroja Îranê diyar dike: Direjî û berdewamiya tevgerê, û wêrekiya gel, radîkalbûna slogan û daxwazan, bingeha girseya berfireh a tevgerê ku xwe di çarçêveya pirseke nijadî, civakî û netewî de de sînûrdar nekiriye û daxwazên xelkê ku êdî yekîtî û rojane ne, bi hinek reforman bên çareserkirin; Ev hemû xal piştrast dikin ku armanca sereke ya şoreşa Jînayê hilweşandina Komara Îslamî ye. Girseya gelên Îranê qonaxa destpêkî lê esasî ya vê şoreşê, ku pirsa herî dawî ya rewatiya Komara Îslamî û bingehên bîrdozî yên rejîmê ye, bi serkeftî derbas kirin. Niha giraniya berdewamkirina tevgerê û gihandina wê bigihêje erkê li ser milê opozisyona rejîmê ye, û pêkanîna



wê girêdayî yekitî û yekrêziya rêzên hêz û tevgerên siyasî û avakirina wê ye. Alternatîfa Komara Îslamî ye. Di vê navberê de, Kurdistan wek bihêztirîn û birêxistintirîn beşê Îranê û pirsgirêka Kurd bi hemû taybetmendiyên xwe ve, bûye faktoreke girîng di gotûbêjên derbarê çawaniya pêkhatina paşeroja Îranê de. Di vê heyamê de hêzên siyasî yên Kurdistanê bi tekezî li ser siyaseta xwe ya berê û herdemî, hewlên berdewam dane bo têgihiştina vê xalê ku çareseriya pirsa Kurd derfetek bo paşeroja Îranê ye, ne metirsîdare û hemû aliyên netewî û netewî. Pirrengiya olî ya Îranê bi hev re kar bike û bi awayekî yekgirtî, bi tekezkirina li ser îdeal û xalên hevbeş û danîna kêşeyên nakok, sîstemeke siyasî ya demokratîk û laîk dûr ji navendîparêziyê ava bike.
Gelî azadîxwaz, welatparêz û berxwedêrên Kurdistanê!

Gelên yekgirtî û serbilind ên Îranê!
76sal bi ser darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed re derbas bûn. Dijmin wisa difikirî ku bi îdamkirina Pêşewa û rêberên din ên Komarê re, tomara dîroka azadîxwazên Kurdistanê tevlihev bûye. Lê piroseya tekoşîna Kurdî di heft dehkên borî de û encamên şoreşa Jînayê di şeş mehên derbasbûyî de, encamên berevajî xeyalên rejîmê derketine. Ji ber ku piştî derbazbûna bi dehan salan li ser bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalbendên wî, di ronahiya çanda têkoşîn û qurbanîdana ji bo ax û nîştiman, ku mîrata canê rêberên Komara Kurdistanê ne, tevgera siyasî

»»»Dom R:3

»»»Doma R:2

ya Kurd di têkoşîna rizgariya neteweyî û avakirina demokrasiyê de faktoreke girîng e.

Bi helkefta 10` Xakelêweyê salroja şehîdên Kurdistanê, em hemû şehîdên "Çiya" û "Bajar" silav dikin û li ber rewana pakê van xebatkaran serê xwe li ber xwîna razayî û malbata serbilind ya şehîdan ditewînin. Di heman demê de bi wan re peymanê nû dikin ku heta bidestveanîna armacên şehîdên xwe, em dest ji têkoşînê bernadin.

**Silav li riha pakê Qazî Mihemed!**

**Silav li hemû şehîdên Bajar û Çaya!**

**Silav ji bo gelê azadîxwaz ê Îranê û gelê mafxwaz ê Kurdistanê!**

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Karûbarên Civakî**

**8`ê Xakelêweya 1402`an**

# Çeka xapandinê



**N. Nûredîn Sofîzade**

Çekên ku dujmin bi dijî doza netewî bikar tîne, cudane û an jî heçî çekekê zêdetir cihê tirsê û dikare derba herî giran ji doza netewî ya Kurd bide, çeka hizrî û teorî ye. Dujmin ger bi çek, bombe, top, êrîşa serbazî û fizîkî karîne derbên xeda ji gelê Kurd bidin, lê çi yek ji wan çekan nekarîne dengê doz û tevgera rizgarîxwaziya Kurd mat bikin, lê mixabin çeka teorî û hizrî ku rejîmên dagîrkar yên Kurdistanê bi dijî tevger û şoreşa Kurdan bikar anîne, kariye derbên giran ji yekîtî û yekrêziya nava Kurdan bide, û netifaqî û çend desteyê bêxe nava Kurdan.

Dujmin ku hertim xwe li hember yekîtî û yekrêziya Kurdan de bê hêz û zelûl dibîne, û hindî bi êrîş û kuştarê cehda xwe dike nikare şoreşa Kurd bixe qedeman û ji nav bibe, lewma hinek pîlanên qirêj bi kar tîne da ku belkî bikare vê hêz û yekîtiya Kurdan û yek dengiya wan têk bide û wan ji hevdu veqetîne û wan lawaz û perş û belav bike, an hekî dujmin karî ji bilî vê yekê ku wan jihev diweqetîne, belkî bi dijî hev du wan bikar bîne û wan bixe nava şerê birakujî de, mixabin di dîroka xebata gelê Kurd de zafin ev rûpelên reş ku Kurdan xwe bixwe şerê hev kirine û dujmin rûniştiye û bera xwe dayê.

Gelek caran di germe germa şoreşeke bihêz a Kurdan de ku dujmin xwe şikestxwarî û bê şiyan dibîne, ji bona xapandina parek ji Kurdan dujmin daxwaza rawestana tundûtîjiyê û şer û dûr kevtin ji çekê dike û bas ji hinek peyvên weke Demokrasî, wekhevî, aştî, Mafê Mirov û danûstandinê dike, gelê me û şoreşa Kurd bê vê ku hizrê jê bike ku ev daxwaz û paşvekêşiya dujmin ji çi vê çavkanî digire, dest bi ci pê wan peyvên civan û birqoke dujmin tê xapandin û herbixwe bi destê xwe alîkariya cîbicî bûna vê pîlana dujmin dike.

Dujmin dema xwe li hember doza Kurd de bê hêz dibîne, bas ji rêçarên demokratîk dike, bi bê vê ku bas ji eslê meselê anku mafê çarenivîsa Kurd bike. Ne tenê dujminên deshilatdar, belkî binav opozisyona xwediyê hizra tevawiyet xwaz û nijad perest jî, li hember daxwazên neteweya Kurd de heman rêkar û teoriyê digirine berahîka xwe.
Ez bawer im ku daxwaza demokratîk kirinê, ji aliyê rejîmên deshilatdar û opozisyona nijad perest ve, tenê û tenê ji bona pêşîgirtina doza netewî ye.

Ger armanca sereke bo hinek Kurdan û hêz û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê "demokratîk bûna" rejîma dîktator û welatê Îranê be, hewce nake hinde ked û xebatê bikin, gelek rê yên din hene û hekî hikûmet û deshilatê bixwastiba ji rêka demokratîk ve pirsan çareser bike, bê guman çi hewcehî bi bikaranîna çekê û rijandina xwînê nedikir, vê demê me dê ji xwe re pergalekî aştiyane bigirtiba berahîk xwe û bê êş û zehmetî emê bikevtibana pey bidestveanîna hêviyên xwe.



Ahan li vir de ye ku, divê heçî Kurdekî welatparêz hinekê bi kûrî bera xwe bidin vê mijarê, û ji xwe bipirsin ma pareke berçav û bihêz bi navê reformxwaz li nava sîstema Komara Îslamî bixwe de li hember aliyê kevneşop parêz de nesekinîn û bi navê islahteleb bo heyama çend salan xelk xapandin, ma karîn tenê pêngavekê bihavêjin ku bi qazancê xelkê welat be?

Erê gelo ma niha jî kesekî hinde sawa di nava me Kurdan de peyda dibe ku, bawer bike ku ji rêya danûstandinê û riya demokratîk û bi aştî , maf û azadiyên neteweya Kurd dê dabîn bibin?

Erê gelo ji bilî rejîmê, hekî opozisyona seranserî jî, bawerî bi mafê netewî heye û hekî ji vê yekê ne di Îrana piştî rejîma Îslamî de divê Îran ya hemî Îraniyan be, û daxwaza hevalbendiyê ji Kurdan û netewên din dikin bo sernixûniya rejîmê, çima ji bilî hinek peyvên birqok ên wek sekolarîzm, demokratîk, tenê peyvekê bas ji mafê Netewan nakin?

Çima basa mafê çarenivîsa netewan nakin? Çima bas ji Îraneke Federal, an navçeyên xwedmuxtar bo netewan nakin?

Bê guma ji bîra kesê neçûye ku, dema Xumeynî li Firansayê bû, heman gotinên birqok ên wek demokrasî, sikolarîzm, azadî, edalet, azadiya ehzaban û siyasî dikir û digot Ol divê karê xwe bike û dewlet karê xwe, bi vê wateyê ku Ol û Dewlet ji hev cuda bin, me dît ku piştre dema hat Îranê, çi anî serê welat û xelkê welat.

Armanca sereke ya min ji vê nivisînê ev bû ku, min xwast 2 xalên sereke bixm ber çavan û zelal bikim ku nabe em bên xapandin.

**Ev xalên serekejî evin:**

1 – Heçî dema ku hikûmetên deshilatdar û dictator ên dagîrkerên Kurdistanê xwe li hember hêz û şoreş û yekîtiya gelê Kurd de lawaz dibînin, bas ji rêçarên demokratîk û aştiyan a pirsa Kurd dikin, hem daku belkî bikarin Kurdan bixapînin û jihev veqetînin, û hem heta careke din bikare xwe bihêz bike bona tepeserî û êrîşa bi dijî Kurdan.

2 – Hêz û aliyên binav opozisyona seranserî ku niha li deshilatê de ninin û hêza tepeserî û kuştara gelê Kurd çinin, bi çend peyvên birqok ên wek birayetî, wekhevî, demokrasî, dixwazin parek ji Kurdan gel xwe bixin, daku hem xwe bihêz bikin, û hem jî netifaqiyê bixn nava mala Kurdan.
Sed mixabin dujminan gelek caran karîne di bikaranîna wan 2 xalan de bi dijî gelê me û doza berheqa me de serkeve û piştî hingê ku Kurd hay xwe dibin, dibînin her tişt ji dest wan der çûye.

Lewma, bila em hişyar bin, yekîtî û yekrêziya xwe biparêzin, vê demê ye ku her kesek dê îtraf bi hêza me û mafê me bike.

# 76 sal berî niha



N:Rostem Cihangîrî

Îsal em carek din ber bi 10ê Xakelêweyê ve diçin, ku di vê rojê de dujminên Kurd û Kurdistanê,

Qazîmihemed yekem Serkomarê Kurdistanê li Mihabadê tevî du heval, hev çeper, hev bîr û bawerên xwe, ku her li binemala wî bûn, Mihemedhisên Sêfî Qazî û Ebulqasim Sedrê Qazî bi Pêşawa re hatin sêdaredan û şehîd kirin.

Qazîmihemed li 1ê Ayara sala 1900an li malbateke, navdar li bajarê Mihabadê jidayîk bû, xwandin û fêrbûn her li Mihabadê dest pê kir, çûnkî li malbateke xwendevar û siyasî de mezin bû, her zû têkildarê karê siyasî bû, bi zanîn û têgihîştina wî ,li nava xelkê Mihabad û bi giştî Kurdistanê cihê rêz û hurmetê bû.

Ew li ber destê bavê xwe fêrî karûbarên qezayî bibû, piştî mirina bavê wî, wî karûbarên qezayî li Mihabadê girt stûyê xwe, gelek bi başî li wî erkî de serkevtin bidest anî, û baweriya xelkê Mihabad û derdora Mihabadê bidest anî, êdî Qazîmihemed bibû kesayetiyekî siyasî û civakyekî binavûdeng. Cihê baweriya gelê kurd, û hemû karûbarên siyasî bixasmanî civakî her li ser destê Qazîmihemed çareserî bo peyda dibûn.

Serdemê şerê duyem ê cihanî bi wekişîna artêşa rejîma Paşayetiya binemala Pehlewî li Milahabad û derdora wê, rola Qazîmihemed zêdetir hat eyan kirin, ew êdî bibû raberê gelê Kurd.

Li wî serdemî de Komela (J.K) ji aliyê çendîn kesayetiyên siyasî û civakî û rewşenbîr ve pêk hatibû û xebata siyasî û netewey dimeşand.
Wê rêxstinê rol û erkê Qazîmihemed di nava gel de didîtin, seba wê hindê bû ku ewan Qazîmihemed bo nava Komela Jêkaf gazî kirin, Qazî bê sê û duyê bike, gazînameya wan qebûl kir û bû endamê wê rêxistinê.

Li gel hatina artêşa sor a Rûsiyayê bo Îranê, tev kesayetiyên navçê dîdar pêk dianîn, her zû neqş û rola Qazî bû van eyan bû, li ser pirsgirêkên nava gel pirs li wî dikirin, daxwaza çareserî an pêşnîyaran li Qazî dikirin.
Bi wan guherînên şerê cîhanî yê duyem, Qazîmihemed li Komeleya (J.K) daxwaz kir ku rewş û mercên siyasî yên navçê wisa dixwaze ku em rêxistinên xwe li gorî serdemê guherînkariyan tê de pêk bînin, û berfireh bikin, bername bo dabirêjin, ew yeka bû ku roja 16ê Tebaxa sala 1945`an (berambar bi 25ê Gelawêj a sala 1324`an) li nava baxê Mikaîl li bajêrê Mihabadê de yekem kongira damezirana Hizba Demokrat a Kurdistanê girê da, navê Komela (J.K) bû bi Hizba Demokrat a Kurdistanê, bernameyeke siyasî û civakiya serdemî bo Hizba teze hatî damezirandin danî, pêka vê bernamê siyaseta Hizbê li ser sê bingehan hat danîn.

**1- Demokrasî**

**2-Bidest xistana mafê netewey a gelê Kurd,**

**3- Edaleta civakî,**

Dixwazim bêjim ku, ew xast û bername heta niha jî her xastên stiratîjîk û esasî yên wê hizbê ne, ew hemû li hizr û fikar û lêzanîna Qazîmihemed serçave dihat.

Her seba wê lêzanîn û şarezaya wî bû ku bi têkrayê dengên beşdarên li yekemîn kongira Hizbê bi serokê giştî yê wê Hizbê hat diyarî kirin.
Şarezaya Qazî û rêberiya Hizbê bihevre karîn li wî zirûfê de li nava betalîya ku li bajarê Mihabadê û derdorên wî de hatbû pêş, gelek bibaşî îstfade lê vergirin û li nava gemên siyasî yên wî zemanî de navê Kurd û Kurdistanê zindî kirin û anîne rojeva siyasiya navçê û siyaseta navdewletî.



Tevî ku Qazî û hevalên wî di bin zext û zoriya artêşa sor û Azeriyan de bûn. Wan dixastin ku Kurd beşek bin li dewleta Azerbaycanê, lê ew xasta gelek bi tûndî ji aliyê Qazîmihemed ve hat red kirin û ragihand ku, Kurd miletekî cuda ji hemû miletên din e, xwediyê ferheng û kultûr û ziman û axa xwe ye, dibe ku çarenivîsa xwe bigire dest xwe, lewma hate Mihabadê tevî mişûr kirin tev kesayetiyên Kurd, gihîştin wê baweriyê ku dewleta Kurdistanê bi şêwaza komarî damezirîn in.
Biryar dan roja 2ê Rêbendana 1946ê Komara Kurdistanê ragihand, li civîneke berfireh de ku li bajarê Mihabadê, Qazîmihemed bû Serkomarê Kurdistanê.

Komara Kurdistanê li jêr serokatiya wî de, di demeke pir kurt de, anku di 11 mehan de, karîn gelek destkevtên siyasî û netewey û civakî û ferhengî û eskerî bidest bînin.

Wek, zimanê Kurdî, zimanê resmî yê Kurdistanê, rijnama Kurdî çap û belav kirin, govar û belavokên zarokan belav kirin, şanoya Kurdî birêve birin, mekteba Kurdî hat damezirandin, qutabî bo yekem car li dîroka Kurdistanê de, bi zimanê dayîka xwe xwandin û nivîsîn. Ala Kurdistanê û Sirûda Netewey ya Ey Reqîb pesend kirin, navê çekdarên Kurd, danî bi navê Pêşmerge, spaha milî ya yekgirtî ya Kurdistanê hat damezrandin.
Ya herî muhimtir ew bû ku, civaka Kurd ya wî serdemî pişka herî zêde li gund û bi şêwaza Eşîrey dijiyan û pişka herî zêde ya civaka Kurd nexwandevar bûn, jinan ti derfeta kar û maf nebûn, li ser destê Qazîmihemed û Hizba wî Yekîtiya Jinan û Yekîtiya Lawan hatin damezirandin, Qazîmihemed bo wê ku ew Yekîtiya Jinan bixasmanî serkevtinê bidest bixe, daxwaz li hevjîna xwe, Mîna xanim kir ku, jin û keçên binemala xwe bişînin nava Yekîtiya Jinan, hevjîna xwe handa ku bibe endama Jinan û berpirsayetya jinan bigire stûyê xwe, ew biryara bû sedema wê yekê ku ti kes astengiyan bo jinên xwe çê nekin, bişînine nava Yekîtiya Jinan. Ew yeka bixwe li wî zirûfê de înqlab û şoreşek gelek mezin a civakî bû li nav civaka Kurdî de.

Qazîmihemed li meydana siyasî û dîplomasiya wî demî de jî, rêber û dîplomatekî karîzmatîk bû. Tucarî li wî barî de kêm nedhînand, berevanî û bergirîyeke mezin li miletê xwe û Kurdistanê dikir, serkevtin bidest dianî. Pêwendiya Komara Kurdistanê tevî mezintirîn zilhêza wî serdemî anku Yekîtiya Sovyetê çêkir û wî welatî Komara Kurdistanê biresmî nasî, pêwendiyên wî tevî dewleta Azerbaycanê ku li Tewrêzê pêk hatibû, pêywendiyeke stiratîjîk çêkir, nehêla ku ti şerek di navbera Kurd û Azeriyan de li deverê çê be. Ew di siyaset û hevpeymaniya di navbera wan de hat demezi-

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

randin heta niha jî cihê rêzê ye, dostayetiya du gelên Kurd û Azeriyan li ser wê esasî birê ve diçe, her wisa pêwendî bi Hizb û rêkxistinên beşê din yên welatê Îranê çêkir.

Demokrasî tam bi manaya xwe li Komara Kurdistanê hat damezrandin, li Komarê de ti dizî û talan rêgirî û kuştin nebû, kes li ser bîr û hizra cudaya siyasî nehat girtin an lê pirsîn lê nedihat kirin, zîndaniyên siyasî tunebûn, wan gelek kar û xizmetên ku Qazîmihemed li Komara Kurdistanê de cîbicî kirin, bûne destkevtên mezin û dîrokî bo Kurd û Kurdistanê.

Her ew xizmet û karên binirxên Komara Kurdistanê û Qazîmihemed bûn, ku dewletên dîktatorên navçê û bixasmanî dewleta Padşahiya Îranê ku dîktatorekî bereday û hov bû, nedihat qebûl kirin, seba wê yekê bi kiryareke navdewletî ya ji aliyê Îngilîs û Amerîka û heta Yekîtiya Sovyeta wî serdemî de bi hevkariya dewletên navçê rejîma şahenşahî leşkerên wî ku li hemberî êrîşên artêşên neyar de rojekê xwe ranegirtin, lê bo serkut û jinavbirina Komara Demokratîk a Kurdistanê jinav bibin, diyare Qazîmihemed tevî wê hindê gelek kar û xebat kir ku mesela Kurd bi şêwaza diyalogê çareşer bike, digel wê ku dujmin gelek qewil bi Qazî dabun,lê li merema dujminan agehdar bû, ku dixwazin Kurdan qetlam bikin, tevî mişûrê gel kesayetiyên bajarê Mihabadê hate ser wê qirarê ku nabe şer bê kirin, daku Kurdistan wêran nebe, xortên Kurd nehên qetilam kirin, ew bû artêşa Îranê hate nava Mihabatê, komar hat hiloşandin, paşî çend rojan serkomar û hevalên wî hatin desteser kirin.

Qazîmihemed roja ku bû bi Serkomarê Kurdistanê sonda serkomarî yê xwar, got miletê Kurd li xweşî û nexweşiyan de bi tenê nehêle, ti li destê wî bê kirin, dê bike bo parastin û serweriya van, her seba wê sonde, qirar da ku li bajar bimîne der nekeve, tevî wê ku gelek îmkan hebû wir derbikeve, lê vefadar bi sonda xwe ma, berpirsayetiya wê Komarê hemû xist ser milê xwe, gelê xwe li nav dadgeheke teşrîfatî ku ji aliyê generalên artêşa Îranê ve, ku bo wî pêk anî bûn, berevanî kir û ragihand ya ku hatiye kirin, anku pêk anîna Komara Kurdistanê bi qanûnî û mafê berheq yê Kurd zanî, hatina artêşa Îranê bi neqanûnî zanî, ragihand wir axa Kurdistanê ye, wira Kurdistan e û cihê hemû xortên Kurdistanê ye, dê rojekê her azad bibe, di bigihîje mafên xwe yên netewî û berheq.

Qazîmihemed li rojên dawiya jiyana xwe ya pir li serwerî de, bo gelê xwe vesiyet kir, bixwînin û yekgirtî bin, pişta hev bigirin, baweriyê bi dujmin ne înin, bi yekgirtin û yekdengî kar bo azadî û serbestiya welatê xwe bikin. Got li karê xwe poşman nin im, yaku min kirî rast e û mafê berheq û bi bê wirde û wirda ya Kurdistanê ye.
Dujmin gelek dixast ku Pêşewayê mezin yê Kurd teslîmê xastên xwe bike, lê nekarîn Pêşewa gelek mezintir bi mezinahiya miletê Kurd bû, wî bi wî karê xwe karî bibe serwerê gelê Kurd, bo heta hetayî, dujmin bi serşorê xwe da zanîn.

Ewa bû, ku li 10ê Xakelêweya 1947an de navbirî tevî hevalên wî yên bi navên, Sêfî Qazî û Sedrê Qazî hatin şehîd kirin.

Paş şehîd kirina Qazîmihemed û hevalên wî, ne Hizaba wî û ne jî gelê wî rê û rêbaza wî bernedan, xebat bo ser kevtinê domandin, bi hezaran Qazîmihemed afirandin, paşî 76sal şehîd kirina wî Hizba wî Hizba Demokrat a Kurdistanê her li meydana xebatê berdewam e, niha rêbaz û hizr û baweriya wî buye qelehek mezin, tu hizekê nekariye li xebatê rawestînin, xortên Qazîmihemed wesîyet û şîretên serkomarê xwe kirin neynûka xebata xwe, roj bi rojê gelê Kurd li Kurdistana Rojhilata wî de dîrokê diafirînin, heta serkevtina Kurdistanê ranawestin.

**Qazî û şehîdên Kurdistanê bi xebat û şehîd bona xwe serê gelê xwe bilind ragirtin.**

**Silav li riha şehîd Pêşewa Qazîmihemed û hevalên wî**

**Silav li şehîdên Kurd û Kurdistanê**

**Bijî Kurd û Kurdistan**

# Navenda Hervkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê xwenîşandaneke berfireh li Almanê bi rê ve bir




şoreşa Jînayê, gelek hizb û rêxistinên siyasî li ser daxwaza Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistana Îranê xwenîşandaneke mezin lidar xistin.

Di vê xwenîşandanê de peyama hevpar a Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistana Îranê, Kongreya Netewên Federal a Îranê, Şêwreya Demokrasîxwazan û Hevpeywendî bo Azadî û Wekheviya Îranê ji aliyê “Behar Husênî” ve hate xwendin.

Di beşeke vê peyamê de hatiye: “Di dîroka Îranê de me ezmûnek wisa ji bo hilbijartina sîstemeke siyasî nebû, bi taybet heta qasekî ku bi sîstemeke siyasî mîna rejîma Komara Îslamî ku bi tenê jî erê yan jî ne dengê bidin rû bi rû bûn. Di 12ê Xakaleweyê de li Îranê rejîmeke îdeolojîk hate avakirin ku ji wê demê û vir ve bi hezaran mirov hatin kuştin û bêserûşûnkirin.”

Hêjayê behskirinê ye ku di vê xwenîşandanê de çendîn çalakvanên siyasî û endamên hizbên Almanî û herwisa çalakvanên siyasî yên netewên din ên Îranê peyamên xwe pêşkêş kirin.

# Xaka Evînê



N: Kerîm Perwîzî

**8`ê Xakelêweya 2723`an**

**Dibêjin xak meyl bere**

Goya mirov girêday hev in û ev girêdayîbûna bi ti veqetanekê çê nabe, ku yek ji wan çûna bin xakê ye, êdî ya din meyla wê bo qut dibe û ev girêdayîya wê\î bo nambîne. Renge ev yeka rast be, renge mirin qutbûna zencîreyî ya mirovan bo hev du be. Lê, hinek caran meyl tune ye belkû xak jî girêdayî mirovekê dibe.

Kurte vîdyoyek li ser xaka kesekê hatibe girtin ku li ser xakê de alayek û axabaniyek daliqandiye.
Bixwe li hundrî xwe de, ev dîmena renge tişteke pir aram be. Renge di wateya sembolên wê de kûr nebî, tiştek wisa jêra nebêjî û gelek bi normalî li kêlegê derbas bibî:
Di panahiyekê de, hatiye destkarîkirin û hinek xaka vê bilind bûye. Li derdora cihê bilindbûna xakê de hinek qevr hatine rêz kirin. Du parçe destmal havêtine serê vê. Yek ji wan destmalan sê rengên, sor, spî û kesk e û di nîveka rengê spî de jî zeriyek

heye ku bi rojê dişibe! Destmala din reş û spî û xişte ye!

Ger wiha temeşeyî vê dîmenê bikin, tiştek pir sanahî tê xuyakirin; Ger ev destmala sê reng bi rojê ve navê dabinên bi Ala û ya din jî bêjin Axabanî ye, bi ser bihustek xakekê danîne, qasekê vê dîmenê giran dike. Alaya sê reng, rengê sor ya şehîdan û spî aştî û kesk avedanî û roj jî heqîqeta Kurdn e, pîroziyekê dide bi vê dîmenê. Axabanî jîsembola pêşmerge û canfîday û can li ser destên Kurdistanê ye. Lê, dema ku dizanî di bin vê xakê de termê Salar Îbrahîmî yek ji fermanderên navûdeng ên Hizba Demokrat hatiye defin kirin. Êdî rewş bi tevahî diguhere ... Şehîd naveke din e û sembolekе din daye bi dîmenê û xak jî guheriye!

Êdî wirda xak meyla vê tune ye, belkû xaka vê bixwe girêdayî şehîdan bûye! Ev xaka sanahiye, ku li hundrî dilê xwe de şehîdek hilgirtiye, heta navê wê jî diguhere û dibe bi nîştiman!

Bihust bi bihusta xaka Kurdistanê tevbigerî, her çawan ku helbestvanê paye bilind Ebdula Peşêw dibêje: Kêmekê serê xwe bitewîne tanca gulîlkan ya xwe li serê xwe bike, çimkû li hundrî bihust bi bihusta vê xakê de canfîdayek hatiye tomar kirin, dibe li her aliyekê de şehîdek li dilê xwe de hilgirt be.

Şehîd nekû navê xakê diguhere û neku xakê jî girêdayî xwe dike, belkû êdî şiyana meyl birinê nahêle, û pêgeha mirov jî bi tevahî diguher e.

Mirovek ku heta bîstek pêştir yekyek bû di nav milyonên din ên mirovan de ku herçiqas xebat û têkoşîn û canfîdayî jî kiribe, dibe ku şaş be û cihê rexne kirinê be, lê di yek deqeyekê de û bi gorîkirina canê xwe di vê rewşê de derdikeve û êdî neku şaştiyan nake û cihê rexnekirinê nine, belkû dibe bi mirovê paye bilind, ev yeka xak û mirov û heta dîrokê jî diguhere.

Roja Şehîdên Kurdistanê, roja 10`ê Xakelêweyê, ev roj e ku serqafileya karwana şehîdan, Pêşewayê nemir li nav de bidar vekirine. Heme Rizayê Pehlewî, kerb û kîneke zêde li Pêşewayê Kurdan hebû, neku ji ber kerb û kîna takekesî û mijareke şexsî, belku di vê barê de kerb lê bû çûnkî desthilata beredayî ya wî bi henek hesab bo dikir û li ser xaka Kurdistanê Alaya Komarê hilda bû!



Paşa Pehlewî, xwe wekî Paşayê welatê Îranê dihesband û xwediyê neteweyekê! Wî wisa dizanî ku Yek Netewe, Yek Sirûk, Yek Ala û Yek Paşa heye. Lê, Pêşewayê Kurdan û rêberê Hizba Demokratê wate Qazîmihemedê nemir, bi îlankirina Komara Kurdistanê jêra got ku Îran Yek Netewe nine, Alaya Kurdistanê jî hilda da ku bêje tenê Yek Ala nine û Sirûda Ey Reqîb gihand bi guhê dost û dujminan, da ku bêje Yek Sirûd nine û wekî serokê Kurdan Komarî ragihandin, da ku ji Heme Riza Şah re bêje ku Kurdan ev wekî Paşa hesab nakin. Her ji ber vê yekê ye ku Paşayê bereday yê Pehlewî piştî hiloşîna Komara Kurdistanê, kerb û kîna koloniyalîstî li ser Kurdistan û Serkomarê vê de rijand û li serspêdeyeke demsala Buharê de, xast Kurdistanê tûşî belengaziyê bike û Pêşwa û hevalên wî bidar vekirin.

Karwana şehîdên Kurdistanê dûr û dirêj e, heta gihîştin bi karwana xebat bo sermenzela serbestiya nîştiman û azadiya neteweya Kurd, dibe dirêjtir jî bibe. Lê, ti yek ji wan sorxelatên Kurdistanê, bi sebeba kerb û kîn û mi`amleyeke şexsî û takekesî canê wan ji wan nehatiye standin û pirsa wan pirseke takekesî nine, belkû pirsa maf û azadiya gelekê ye.

Lewma rêberê nemir, Dr. Qasimlo dibêje: Baştirîn xelat bo şehîdan berdewamkirina rêya wan e. Bi cihê ku bas ji tolhildanê bikin, bas ji berdewamkirina rêya wan dike, çimkû tol pirsê dike bi pirseke şexsî ku piştî kuştina yek ji wan an dehan kes ji hêza dujmin, êdî pirsa tolhildanê dawî pê tê û xwîn li hember xwînê de. Lê, karwana şehîdên Kurdistanê pirseke takekesî û şexsî nebûye û nine, lewma pirsa tolhildanê nine belkû pirsa berdewamkirina rêya wan e. Wate çûnkî ev pirs pirsa neteweyekê ye, tola wan xwînan demekê tê hildan ku pirsa netewe dawî pê hatibe û Kurd azad û Kurdistan rizgar bibe.

Bi dirêjahiya xebata Kurd bo gihîştin bi maf û azadiyên xwe, bi dehan bigire bi sedan hezar qurbanî daye û li pêxema azadiyê de karwaneke dûr û dirêj li rihên ezîzên xwe pêşkêş kiriye.

Şehîdbûna her takeke Kurd, rûpeleke zêrîn û mezin di dîroka serweriya neteweya vê ku amade ye bi îradeya bilind a xwe li pêxema wekhevî û jiyana hevterîb digel neteweyên din de biha û nirxa vê bide.


Lê, vê yekê dizanin ku neteweya Kurd mergdost nine û şehîd ku cem vê neteweyê qedir bilind û pir binirx e û weke bejna mirovekê temaşe dike, neku ji ber vê ku mirin xweş be belkû ji ber vê yekê ye ku rêz li mezinahiya wan kesan tê girtin ku, li pêxema bexteweriya hin kesên din de amade ne canê xwe fîda bikin. Her di vê aliyê de, ku ev neteweya, silogana "Jin, Jiyan, Azadî" serî radike çûnkî li pêxema jiyana baştir de xebatê dimeşîne û herçawan Dr. Qasimlo dibêje: Heta jin rizgar nebe civak jî nagihîje bi bexteweriyê û canfîdakirin jî her li pêxema jiyana baştir û kêrhatiyê mirovê hişmend yên vî serdemî ye.

Xaka li Kurdistanê de, li hember şehîdan meyla ber nine û bixwe bûye bi evîndarê şehîdan û li hundrê dilê xwe de wan radigire da ku vê roja rizgarî û azadiyê, baskên xwe li ser Kurdistanê de bide û vî demî hemû ev cihên ku bi nirx û buhayên ku termê şehîdên wan wir hatine veşartin, dibin bi cihên girîng û semboldar bo gotina dersên jiyanbexişîn û avakirina paşerojê.
Salroja şehîdan bilind û rêya wan tijî rêwîng be.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî:”**
Hevalbendiya bihêz a bona rûxana Komara Îslamî, divê pêka xast û daxwaziyên xelkê Îranê bê avakirin



**“Analna Berbok”:**

Em dixwazin bi beşdariya Fransa, Misir û Urdunê civîneke aştiyê li Rojhilata Navîn pêk bînin.



**“Yoav Gallant:”**

“Em rê nadin Îran û Hizbullahê zirarê bidin me.



**“Riza Ekremî”:**

Ji bo dapoşîna jinan demsala herî baş zivistan e, Zivistanê berdidin û niha ku Bihar e, dibêjin divê çi bê kirin

# Newroza îsal, Newroza Jînayê bû!



## Eskender Ceiferî



Newroza îsal, Newroza Jînayê bû!

Eskender Ceiferî

Ji destpêka şoreşa Jînayê ve heya niha çendîn caran xelkê Rojhilat rêfrandoma xwe bi rêve biriye. Hem bi gireva giştî, hem bi serhildanê û niha jî bi pêşwaziya Newrozê li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê, rêfrandoma Rojhilat birêve çû.

Rêjîma Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heya dema ku partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, rêjîma Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine rêwresma Newrozê bi rengekî hêja were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî jî, weke rêjîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî yên Rojhilat, herî dawî li ser pêşwazîkirina hevpar ji Newrozê lihev hatin. Ev jî pêşwaziya Newrozê li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê bû. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji rêjîma Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên netewî û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Piştî biryara han a pêşwaziya hevpar li Newrozê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgereke mezin di nava Sipaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Sipahê amaje dikin ku bajarên Xurasanê, Sine, Îmam, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistina terorîst. Bi vî rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku basa Newroza hevpar a aliyên Kurdî li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê bike, bê girtin.

Ji xeynî tevgerên Sipaha Pasdaran, selefî jî li hemberî netewegiran têne çalakkirin. Plana herî dawî ya rêjîma Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku neteweparêziya Kurdî di landikê de bifetisînin. Li gora zanyariyên çavkaniyeke veşartî ya saziya Îstixbarat angu Îtilaata Îranê, eger tevlîhevî yan jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilat mezintir be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, girtina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatiyan zêde dibe. Tepisandina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rêjîmê. Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma Newrozê lê tevî vê jî xelk cejna xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide.

Îsal jî Newroz, Newroza Jînayê bû.

Her Newrozek, ji bo Kurdan rêfrandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî rêjîma faşîstên Tehranê li hemû navçe, gund û bajaran pêk tê. Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hilbijartineke dêmokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hilbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di Newrozê de biryara xwe li dijî dagirker distînin û soza xwe bi riya şehîd û cangoriyên niştiman re nû dikin. Îsal jî wan Newroza xwe li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê pîroz kir.

Niha, rêfrandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê partiyên di nav Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê ve bi rêve diçe. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne. Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û bi reqs û dawetê, dilê dagirkar bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û Newroza me, dengê dijatiya me li hemberî dagirker e û dengê serhildana Jînayê ye.

# Komkujiya Cindirêsê û Opozîsyoneke kirêgirtî û mûçexwer



**N: Ebdûlazîz Qasim**

Têkiliyên di navbera Partiyên Kurd û opozîsyona Sûrî de û daxwazên derketina Encûmena Niştimanî ya Kurdî ji nav çarçoveyê opozîsyona sûrî ya nijadperest ya bi navê “Îtîlaf”, nemaze piştî erdheja Mereş û Cindirêsê ya di 6’ê meha borî de ket rojevê û bi taybetî piştî komkujiya hovane ya li şeva Newroza 2023an digel bilindkirina sloganên DAIŞê û dirûşmên dijî kurdan, û kuştina çar welatiyên kurd li ser destê milîsên terorîst yên opozîsyona Sûrî ya mûçexwerê Tirkiyê.

Helbet Komkujiya Cindirêsê ne yekem komkujî ye ku bi destên milîsên terorîst yên opozîsyona girêdayî dewleta Tirk li dijî gelê Kurd tê pêkanîn û goman têde nîne, ku wê ne dawî komkujî be, ku rojane bi dehan tawanên dijemirov yên qirkirinê li ser destê dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê yên terorîst li dijî hebûna neteweyî ya Gelê Kurd têne pêkanîn, ku PYD û ENKS, herwisa hemû rêxistinên kurdî ji aliyê exlaqî ve berpirsiyariya parastina hemû mijarên girêdayî doza netewî ya Kurd û gelê Kurd bi giştî hildigirin û pêdivîye ku bi awayekî cidî li hember wan tawanên li dijî man û hebûna Gelê Kurd rawestin.

Wisa xuya dibû ku berî erdhejê ti giringiyek bi rewşa Efrînê û navçeyên Rojavayê Kurdistanê yên dagîrkirî di karname û siyaseta partiyên kurdî de nebû, û pênc sal derbas bûn ku rewşa Herêma Kurdaxê hatibû paşguhxistin, tevî qîr û hawarên Kurdaxiyan û xelkê Serêkaniyê û Girê Spî, û bangewaziyên nivîskar û siyasetmedarên kurd yên serbixwe.



Îro li hember vê komkujiya hovane li şeva pîroz ya Newrozê, dubare ku ji tevgera kurdî tê xwestin ku bersiva daxwazên Kolana Kurdî bidin û siyasetên xwe serrast bikin, bi taybetî daxwaz ji ENKSê dibe ku helwestek cidî hebe li hember opozîsyona Sûrî û tawanên milîsên wê yên terorîst li navçeyên dagirkirî, bi taybetî ku di xwepêşandana çalakvanên Kurd li bajarê Kolnê yê Almaniyê li ber konsulxaneya Tirkiyê di 25ê Adara 2023an de, ku tê de daxwaz ji aliyê xwepêşanderan hat kirin ku dîtir PYD ji bilî Ala Kurdistanê tiştek din bilind neke û herwisa daxwaz ji ENKSê jî hat kirin ku yan Efrîn, Serîkaniyê û Girê Spî û Girê Spî helbijêre, yan jî bimîne li tenişt opozîsyona Erebî-Îslamî ya nijadperist û bibe hevparê tawanên wê.

Ew grûpên ser bi grûpa “Îxwan El-mislmîn” ya ku dijminatiya Gelê Kurd dikin û xizmeta ajandayên dagirkeriya Tirk dikin û bi awayekî aşkere ji bo dubarekirina xîlafeta îslamî ya Erebî dikin, û hebûna ENKSê di nav çarçoveyê xwe de bo mebestên dijminatiya maf û doza Kurd bikar tînin, ku di van salên borî de, hin serkirdeyên ENKS bi hinceta ku Kurd bi tinê bi rêya opozîsyona sûrî ya alîgirê Tirkiyê dikarin daxwazên xwe bigehînin Cinêf û civaka navneteweyî, bêyî ku hewl bidin li hin kenalên din yên dîplomat bipirsin, ku îro dîtir hincetên wisa nayê pejirandin nemaze ku nûnerên Kurd yên di nava opozîsyona sûrî de heta îro nikarîne ti destkefteke neteweyî bo Gelê Kurd di nava şandên opozîsyon û desteya danûstandinan de bidest xwe ve bînin?!

Di demê ku Xwediyên felsefe û projeyê “Neteweya demokratîk” li dijî her projeyeke neteweyî ya Kurdî radiwestin û ji bo valakirina doza Kurdî ji naveroka wê ya neteweyî dixebtin, hevdem pêwîst bû ku Xwediyên “Projeya Neteweyî” xwe ji hevpeymanîya “Îxwan Mislimîn” dûr bixin, nemaze piştî guherîna slogana wê ji rûxandina rejîmê bo jinavbirina hebûna neteweyî ya Gelê Kurd, herwiha derketina piraniya tevger û kesayetiyên demokratxwaz ji nav opozîsyona alîgirê Tirkiyê, ku niha bi tinê milîsên terorîst û kirêgirtî û girûpeke selefî ya tekfîrî tê de mane, û bi aşkereyî bang bo xîlafetê dikin, herwisa bang li sepandina şerîetê û ferzkirina Ciziyê li ser Gelê Kurd dikin, ku ya herî kêm divê Partiyên Kurdî xwe ji nav vê desteya “Îxwancî” ya faşîst vekişinin, tevî şermezarkirina tawanên dijemirov yên milîsên terorîst yên girêdayî dewleta Tirk û derxistina milîsên terorîst û hawirdeyên dagîrker ji navçeyê kurdî yên dagîrkirî bixebitin, û kar bo dîtina bijardeyên din yên guncaw ji bo parastina doza Kurdî bêyî ku doza Kurdî bikeve di nav nakokiyên mezhebî (wekî şerê elewî-sunnî) û şerê li ser kursiyê desthilatdariyê de, herwisa nakokiyên ku em nikarin barên wan hilgirin.



# Diyarkrina Çarenivîsa Xelkekî an Neteweyekî. Ango Xwe birêvebirin(self Determinasyon)

**N: Kofîxwar**

Wekheviya xelkan; Diyarkirina çarenivîsa xelkê an kêm neteweyan bi hemû aliyan ve xwestina mafên bi rê ve birina xwe ye.

Têgeh bi Îngîlîzî ketiye rojeva cîhanê lewma, em ê pirtir navê wê bi Îngîlîzî ango self determinasyonê bi kar bînin.

Di dirokê de bi aşkere cara yekem li dijî mêtînkariya Îngîlîzan li parzemîna Amerîkayê derketiye holê. Mêtîngehên Împaratoriya Îngîlîzan yên Amerîkayê di sala 1776`an de diyar kirin ku naxwazin bi destên dewleteka li derve bên îdare kirin û hemû hebûn û kedên wan neyên xwarin.

Di encamê de serbixwebûna xwe îlan kirine. Lê, heta piştî sala 1789`an li Parîsê bi daxuyaniya mafên mirovan ev maf û têgeh ewqas berbelav nîn bû. Piştî daxuyaniya1789`an Arteşa Şoreşa Fransayê bajarê Nice, Savoy, Avignonê bi dest xistin.

Piştre wek formaliteyekê gelpirsiyek li xelkên wan bajaran kirin. Gelo xelk ji dil dixwazin tevî Dewleta Fransayê bibin an nebin. Gelpirsîn(referandum) curek diyar kirina çarenivîsa xelkê bicîhbûyî ye.

Self determinasyon; Çarenivîs û pêşeroja xelkê bindest, rizgarbûna welatên wan î dagîrkirî û mêtîngeh nîşan dide. Lewma, mafekî bihevpariye. Ango heke welat rizgar bibe xelk xwediyê bi rê ve birina xwe ye.

Di heman demê de dê hemû mirovên bindest rizgar û azad bibin. Mafên bingeh, kulturî, çandî, dinî, însanî jî dê bikeve bi destê wan. Self determinasyon di huquqa navneteweyî de mafekî pirtir girîng û herdemî ye.

Ev di sedsala dawîn de bi vê esasê ve mêtînkariya klasîk ji holê rabûye, împaratoriyên mezin wek Osmanî berbelavbûn e.

Dewsa wan îro gelek dewletên neteweyî ava bûne. Dibe ku gelek dewletên piçûk wek Kosavaya li Balkanan jî dê ava bibin. Çimkî pirsgirekên hîn netewe û kêmneteweyan hêj çareser nebûne. Xelk û neteweyên bindest hêviya dewlet bûnê ne.

Dixwazin xwe bi vê esasa navneteweyî ve rizgar bikin. Lewma, girîngiya wê jî heta pirsgirekên netewe, kêmnetewayan,xelkan hebe dê berdewam bike jî.

Du aliyên vê esasa bingehîn hene. Ji wan yek xelkên bindest êdî bêhtir hişyar bûne, li ser axa xwe tu kesî, hêzî, xelkî qebûl nakin. Dixwazin bi hebûna xwe ve, li ser axa xwe, xwe bi xwe bi rê ve bibin.

Heger dewletek di nav sînorên xwe yê sîyasî de li dijî komeka etnikî, dînî, neteweyî û ... hwd an jî li dijî xelkekî li ser axa xwe derkeve mafên wan yê însanî, sîyasî, etnîkî, neteweyî, zimanî û ... hwd bin pê bike ev ne tenê pirsgirekên li nav wê dewletê ne.

Pirsgirekên berbiçav in êdî ne tenê pirsgirekên neteweyên mexdur in an jî yên wê dewletê ne; Pirsgirekên mafên mirovayî ne.

Ji ber wê dikevin rojeva cîhanê. Ji xwe huquqa navneteweyî nahêle mafên mirovan tenê di nav dewleta heyî de bêne çareser kirin.

Dewleta ku mafên xelkekî an komeka taybet bin pê dike pêşiyê di saziyên navneteweyî de tê şermazer kirin û hişyarî lê tê kirin.

Ji mexduran re huquka navneteweyî ya mafên mirovan rêya self determinasyonê nîşan didin. Lê, mixabin bikar anîna self determinasyonê, bi rêveçûyina vê esasê ewqasî hêsan nîn e.




Divê pêşiyê bi hişyariyên hêz û huquka navneteweyî, saziyên mafên mirovan ve di hundurê wê dewletê de bi huqukî bên çareser kirin.

Heger bi rêya di zagonên hundurîn de neyên çareser kirin îca ji dewleteka mexduriyet çekiriye re desteserkirina siyasî, aborî tên dayîn. Piştre xelkê bindest dikare daxwaza bi rêvebirina xweser an serbixwebûnê xwe û avakirina dewleteke cuda jî bike.

Carinan jî wek rewşa Kosovayê hêzên navneteweyan yên çekdarî midaxileya çekdarî tê kirin. Çimkî mafên mirovan ji berjewendî û sînorên dewletên heyî girîngtir tên dîtin.

Lê, roja îroyîn li ser self determinasyonê gelek niqaş hene. Şert û mercên xwe bi rê ve birinê ne zelal in. Komeleya Neteweyên Yekbûyî, saziyên navneteweyî dikarin bibêjin li gorî berjewendiyên dewletên bihêz yên mezin şert û mercên bidestxistina xwe bi xwe bi rê ve birinê (self determination) safî nekirine. Pirranî li gorî rewş, têkiliyên di gel wê dewletê şirove dikin, diguherînin.

Ji ber wê şertên parastina sînorên dewletên heyî bi zanetî eşkere nekirine. Kengî ku bixwazin şert û mercên vî mafî ji bo xelkê ku ji vê daxwazê dike bi cî tînin an naynin.

Îro li her parçeyên Kurdistanê bi sedan sal tev hezar sal in dagîrkirîne. Li nav her parçeyan bi tenê li Başûrê Kurdistanê mafên xweseriyê bi dest xistiye.

Ango bi self determinasyona hundurîn ve xwe bi xwe bi rê ve dibin. Bakur, Rojava, Rojhilat hêj bindest in. Çekên leşkerî yên dewletên serwer pirtir welatên Kurdan tomar bûne. Kurd wek hemwelatiyên wê dewletê mafên însanî bi hêsanî bi kar naynîn.

Di dadgehan de wek hemwelatiyên wê dewletê doza wan nayê dîtin. Parastina dadmend nayê kirin.

Kurd tim sûcdar in herweha bi hêsanî lêdan, tehde û kuştinê ve rû bi rû ne. Hebûna Kurdan tunebûn e. Lewma, Kurd mecbûr in xwe ji vê rewşê rizgar bikin, bi serbilindî bijîn.

Ji ber wê divê Kurd ji bo bikaranîna vî mafî ji eslê xwe dûr nekevin tim zane, hişyar, li ser axa xwe bi rêkxistin bin û li derveyî welêt diplomasiyeka xurt bi kar bînin.

# Gelo sedsala 21`an dişbe bi sedsala 20`î?



N: Hesen Mukerem



Sedsala 20`î pir bû li tundûtîjî, xwînrêjî, malwêranî û şer, sedsalek ku bi dehan şoreş û kudita û tevgerên rizgarîxwazî û digel du şerên cîhanî.

Gelek kesan wisa dizanîn ku bidawîhatina sedsala 20`î, dê ew hemû wêrankarî, xwînrêjî û şerên çekên pêşkevtî dê dawî pê bê û pêngav havêtina nav hezareke din e, hezareyek tijî hêvî, hezareyek tijî serkevtinên mezin yên mirovhezî û dadperweriyê, ji ber ku karnameya sedsala 20`î tijî li fermander, general, serkirde, heta ew efserên ku di komkujiyan de pêş Firevinan, Nêronan, Rubisipêran heta Îstalîn jî kevtibûn bû.

Di serdema sedsala 20`î de nêzî 50 milyon mirov hatin kuştin, lê sedsala 21`an tevî hebûna rewşenbîr, zana û hebûna zanista biroj, hebûna saziyên berevankar yên mafê mirovan û basên li ser înSaniyet û girîngî dan bi mafê mirovahiyê, em dibînin şer û pevçûn, wêrankarî û cerbandinên çekên pêşkevtî, etomî û belavbûna nexweşiyên pandamîk weke Covid 19 ku bû sedema can jê standina bi milyonan mirovan li cîhanê de.

Îşkence û bidarvekirina azadîxwazan û mirovên bê sûç bi şêwaza herî hovane di kupika xwe de ye, mirovan wisa dizanîn ti sedsalek mîna sedsala 20`î nebûye û nabe lê, sedsala 21`an tevî pêşkevtinên zanist û teknelojiya û hebûna zanyariyan, bûye meydana cerbandina çekên pêşkevtî, û her der şer e.

Welatên mezinhêz û serkirde û dîktatoran, sedsala 21`an ya tijî hêvî û çirûskên jiyana aram û pêşkevtî ya mirovan kirin goriyê zêdexwaziyên xwe.

Her di destpêka sedsala 21`an de li 15`ê Şibata sala 2003`an Amerîkayê digel 36 welatên Ewropayê bi hemû hêza xwe û balafirên pêşkevtî bi hinceta azadiya xelkê Îraqê di bin dîktatoriya Sedam de, êrîşî ser wî welatî kirin û di heyama 19 rojan de desthilata Be`is hiloşandin, lê Îraq bilî Herêma Kurdistanê piştî derbasbûna 20 salan bi ser vê êrîşî de heta niha jî arama nebûye.

Di sedsala 21`an de di sala 2010`an de Bihara Erebî dest pê kir. Bihara Erebî an şoreş, serhildan û xwenîşandanên li çend welatên nawça Rojhilata Nawîn û bakurê Afrîkayê di sala 2010`an heta 2012`an destpê kir. Ev xwenîşandan ji ber ku li welatên erebî dihatin şopandin, weke Bihara Ereban hat binavkirin

Heta îro jî, li welatên ku piranî Ereb lê dijîn li Bakurê Afrîkayê û Başûrê rojavayê Asyayê zincîrek serhildan, meş û protestoyên bêmînak berdewam in.

Buhara Erebî li welatên weke Tûnis, Misir, Sûdan, Ordun, Kuweyt, Mexrib, Cezayîr, Lubnan, Morîtanya, Lîbya, Yemen, Behrêyn û Sûriyayê serîhildan û xwenîşandanên mezin û piçûk derketin.

Di Buhara Erebî de, Sûriye bû qurbaniya zêdexwaziyên mezin hêzan, DAÎŞ wir serhilda û mezin hêzan yanî Amerîka, welatên Ewropayê, Rûsya û heta Îran jî tevlî wî şerî bûn û şer kişandin herêmên Kurdan û ev şer û alozî bi dawîbûna DAÎŞê heta niha jî her li Sûriyê berdewam in.

Îran bi milîş an girûpên girêdayî xwe her roj li cihekê tevdigire û Komara Îslamiya Îranê li Sûriyê ev milîşên xwe di nav eşîrên wek Ebo Kemal û cihên sivîl de cihgîr kirine û Îsraîl jî ji ber metirsiya welatiyên xwe li 2017`an şûnda dem bi dem cih û baregehên girûpên ser bi Îranê bombebaran dike.

Wiha Sûriye li 2010`an şûnda bû bi meydana rikeberiya şerê welatên mezin hêz û ji ber şerê navxweyî yê Sûriyê jî ku ev 12 sal e berdewam e, 8.4 milyon welatiyên Sûrî ji ber tundûtîjiyên şeran û nebûna paşrojek rohn û nebûna aramî û negihîştin bi hêviyên jiyanê, cih û warê xwe terkandine û di welatên Ewropayî de bûne penaber.

Buhara Erebî an tundûtîjiyên sedsala 21`an her li Sûriyê de kom nebûye, şerê di navbera Îran û Erebistana Siûdî de, ku bi navê şerê bedel di navbera her du welatan de tê zanîn û şerê sar yê Rojhilata Navîn e, şerekî bedel yê di navbera Komara Îslamî ya Îranê û Şahenşaya Erebistana Siûdî de ye.

Şerê navxweyî yê Yemenê şerek e ku li sala 2015`an ve di navbera du aliyên ku her yek ji wan xwe weke hikûmeta Yemenê dihesibînin û bi piştgîriya hevalbendên xwe bi hev re li sala 2015`an ve dimeşînin. Şerê di navbera hêzên hikûmeta Ebd Rabbu Mensûr Hadî û tevgera başûr ku navenda wê li Adenê ye, di navbera hêzên Ensarullah û hêzên serokê berê Elî Ebdullah Salih de bû pêk hat û di vê navberê de Komara Îslamiya Îranê jî bi hemû awayî piştgîrî da bi Husyan, bona karteke givaşê li hember Erebistanê de.

Ev şer û nearamî tenê pisîra welatên Erebî negirtiye, rikeberiyên mezin hêzên cîhanê pêl havêtin nav Ukraynê jî, niha mezin hêzan Ukrayna kirine meydana şerê xwe û Ukrayna bi piştgîrgîriya welatên Ewropî û Amerîkayê li hember Rûsya de ev herêm tev tevlîhev kiriye û bajar û gund wêran kirine û Komara Îslamî jî pêka gotina Xamineyî, bi şerê Ukrayên, nezima nû ya cîhanê guherînkarî bi ser de tê, dibe wan jî rol hebe, piştigîrî dide Rûsyayê û agirê wî şerî çend hember gurtir kiriye.

Niha sedsala 21`an bi wan hemû pêşkevtinên warên teknolojiya û zanista di hemû warî de, ku gelek mirovan hizr û xeyal dikirin dê bi destpêkirina serdalsan 21`an hêvî û jiyana aram û cîhanek pir li xweşî û mirov dostî hebin, lê ev hemû şer, buyer û binpêkariyên mafên mirov ji aliyê mezin hêzên cîhanê ve, nîşan dan ku ti cudahiyek di navbera sedsala 20`î û sedsala 21`an tune ye û tundûtîjî, şer û pevçûn, malwêranî û birsîtî û kuştin di kupika xwe de ye.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Stranbêjekî Kurd bo îdareya îtla`ata Sinê hat gazîkirin

Roja Şemî 12`ê Xakelêweyê, stranbêjê Kurd yê bi navê “Yasir Behramî” bo îdareya îtla`ata bajarê Sinê hat gazîkirin û lêkolîn jê kirin.

Pêka gotina çavkaniya haydar a “Kurdpa”yê, hêzên ewlehî li wî stranbêjê Kurd sozname wergirtine ku nabe virşûnda bistire û heta nabe di merasima roja 13`ê Xakelêweyê ya gundê Mîravaya ser bi bajarê Sinê de beşdar bibe û bistire.

Vê çavkaniya haydar zêde jî kiriye ku: “Behramî” ji rêya telefonê ve bo îdareya îtla`ata Sinê hatiye gazîkirin.

Ew stranbêjê Kurd piştî bidawîbûna lêkolînê û wergirtina soznameyê hatiye azadkirin.

## Du welatiyên Kurd li sînûrê Gadera ser bi bajarê Urmiyê hatin kuştin û birîndarkirin

Roja Yekşemî 13`ê Xakelêweyê, welatiyê Kurd yê bi navê “Eynî Qadirnjad” kurê Nadir û xelkê gundê Çiriyava ya ser bi navçeya Mirgewer a bajarê Urmiyê bi sebeba gulereşandina hêzên leşkerî yên hikûmetê li sînûrê Gader, canê xwe ji dest da.

Herwisa di vê bûyerê de, welatiyekî din yê bi navê “Mihemedletîf Xalidî” temen 51 salî û kurê Sofî Taha û xelkê gundê Çiryava ya ser bi navçeya Mirgewer, bi sebeba gulereşandina hêzên leşkerî yên hikûmetê birîndar bûye.

Pêka gotina çavkaniya haydar a “Kurdpa”yê, du welatiyên din yên bi navên “Mihemedsidîq Xalidî” temen 32 salî û kurê Sofî Taha û “Şehram Salihmihemedî” kurê Mihemed û xelkê gundê Çiriyavayê jî ji aliyê hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê ve hatine binçavkirin.

Vê çavkaniya haydar zêde jî kiriye ku: Hêzên leşkerî yên hikûmetê, tevî dest bi ser d girtina kelûpelên qaçax yên wan welatiyan, bi bê haydarkirina berê rasterast gule berdane wan.

Termê “Eynî Qadirnijad” bo Pîzişka Yasayî ya bajarê Nexedê veguhastin e.

## Berdewamiya binçavkirin û bêçarenivîsiya xwandekarê Kurd li girtîgeha Sinê de

“Serdar Şamuradiyan” xwandekarê fekoltiya Amûrên pîzişkî yê zanîngeha Îlmî û Karburdî ya Sinê, bê çarenivîs li girtîgeha wî bajarî de ye.

Pêka gotina çavkaniya haydar: Ev xwandekarê Kurd di heyama binçavkirinê de ji mafê destpêragihîştin bi parêzer bê par bûye.

“Şamuradiyan” roja Sêşemî 6`ê Befranbara sala 1401`an, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî derbasbûna du mehan li ser lîkolîna wî de di girtîgeha îdareya îtla`ata Sinê de, bo girtîgeha wî bajarî veguhastibûn.

Heta niha li derheq tohmetên ku li dijî “Serdar Şamuradiyan” hatine sepandin ti zanyariyeke serast ber dest ninin.

## Kurê Mihyedîn Îbrahîmî girtiyê siyasî yê îdamkirî bo beşa Lêpirsînê ya Dozgeriya Giştî û Şoreşa Urmiy hat gazîkirin

“Ferxedîn Îbrahîmî” kurê “Mihyedîn Îbrahîmî” girtiyê siyasî yê hatî îdamkirin bo taya 9 ya Lêpirsîna Dozgeriya Giştî û Şoreşa Urmiyê hat gazîkirin.

“Îbrahîmî” bi tohmeta têkşikandina deriyê Noberdariya Dadgeha Pêdaçûnê hatiye gazîkirin û li rêkevta 7`ê Xakelêweyê 5 roj derfet ji navbirî re hatiye dan u bo dawîn berevanîkirinê, xwe bo taya 9 ya Dozgeriya Giştî û Şoreşa Urmiyê bide naskirin.

“Ferxedîn Îbrahîmî” roja Pêncşemî 25`ê Reşemeya sala 1401`an rojek berî îdamkirina bavê xwe li girtîgeha Navendî ya Urmiyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û roja Înê 26`ê Reşemeya sala 1401`an bi danîna barimteyê hatibû azadkirin.


Roja Înê 26`ê Reşemeya sala 1401`an, “Mihyedîn Îbrahîmî”girtiyê siyasî yê Kurd li girtîgeha Navendî ya Urmiyê de hat îdamkirin, Komara Îslamiya Îranê xwe ji radestkirina termê wî ji malbatê re parastibû û termê “Îbrahîmî” di cihek nediyar de bi axê spartine.

Îdareya Tomarkirina Nasnameya bajarê Nexedê bi derkirina belgeya wefatê ji bo “Mihyedîn Îbrahîmî” re, sedema wefata wî Cezayê Yasayî ragihandiye.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdiśtanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (443)



# Pêşewa Qazî Mihemed

Şîret û wesiyeta min ew e bila zaroyên we bixwînin, ji ber ti tiştê me ji yê gelên din ne kêmtir e, bi tenê xwendin nebe, bixwînin ji bo hûn ji karwanê gelan paşve nemînin û her xwandin çeka kujeka dijminan e.